# Opozîsyona rêjîma Îranê naxwaze pirsa kurd û gelên din qebûl bike

Bi şorişa pêkhateşikên a "Jîn,Jiyan Azadî" bi pêşangiya gelê Kurd, êdî desthilatdariya rêjîma Îranê bi dewrana pêş şorişa Jîna û piştî şorisa Jîna gav avêtiye.

»»» R:4




*Bideśtveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (464)19-02-2024 Buha (1000) Tûmen*

# Çima xelkê Kurdistanê deng nade?

Gelê Kurd her ji despêkê ve û li ber hebûna fakter û eslên nedemokratîk ku di serî de hatine û hebûna dijberiyê tevî sîstemên nûjen ên şaristaniyê di pêkhateya bingehîn a rejîma Îslamî ya Îranê de, dengê "NA" da rejîmê û ev sîstem li dijî îradeya giştî ya civaka Kurdistanê da nasandin.

»»» R:3

# Ew nikarin mafên me bistînin em jî dengên xwe nadin wan!

Parlamenterên Urmiyê, hem ên Kurd û hem jî ên Azerî, her ew kes in ku li Meclîsa Îslamî ya Îranê de qet nikarin mafên netewî yên Kurd û Azeriyan bistînin. Ji bilî wê ew li ser wêrankirina malên kesên ku bi zêderûyî ew mal çê kirine, dengê erê didin, Bêy ku ti çareserekê ji pirsgirêkê re bînin.

»»» R:7

# Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat: Hilbijartinên11ê Reşemeyê derfeteke din e ku ji Komara Îslamî re bibêjin "na"




**Gelên zilmlêkirî ên Îranê!**
**Gelê berxwedêrê Kurdistanê!**
**Azadîxwaz û partî û aliyên siyasî!**

**Komara Îslamî ya Îranê li roja 11`ê Reşemeyê de binav hilbijartineke din ji bo 12`emîn dewra meclisa şêwra îslamî û 6 emîn dewra meclisa Xibirgan a rêberiyê dê lidar bixe.**

**Ezimûnên 45 salên desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê û lidarxistina hilbijartinên curbicur ên Meclîsê, Meclisa Xibirgan a Rêberiyê û şêwrên gund û bajaran di vê heyamê de, Ceribandina gelek tevger û aliyên siyasî, ji rastgir û çepgir, ji reformxwazan û yên bi navê nerm, û bernameya wan a siyasî ev yek îspat kiriye, ku hilbijartinên di çarçoveya desthilatdariya vê rejîmê de ne tenê nikare bibe çavkaniya ti guhertinekê di berjewendiya xelkê Îranê û rewşa giştî ya welat de,**
**Belkî, dengê xelkê tenê ji bo rewatîdan bi hikûmeta Komara Îslamî hatiye bikaranîn.**
**Her ev ezimûnên han bi me didin zanîn ku hemî cure hilbijartinan di Komara Îslamî ya Îranê de hatiye muhendisîkirin û bi temamî nedemokratîke û hemî cehda rejîm eve ku hilbijartinan wek derfetek bikar bîne ji bo ku çiqasî bikare xelkê zêdetir bîne ser sindoqan û heta di çarcoveya vê lîstika ku pîlan bo darêtiye, bi xekê dunyayê rabigehîne ku rewatiya xelkê li pişta rêjîma wê ye.**

»»» R:2

# Dar li ser koka xwe mirov li ser zimanê xwe şîn

**Pispor dibêjin ku "ziman û hizrkirin wek hev in", "ziman bingeha hizrkirina meriv pêktîne", "hizrên meriv bingeha pêşketina zimanê meriv e" û zaf gotinên din.**
**Yanî ewên ku li perwerde bi zimanê zikmakî tên bêparkirin, ew tinê li nasnameya xwe ya neteweî nayên bêparkirin û tinê nasnameya wan nayê wêran kirin.**

»»» R:5

# Rejîma Îranê ev 45 sal in ku nekariye dengê azadiyê li Îranê de bifetisîne

**22'ê Rêbendana îsal 45 emîn sal bi ser şoreşa gelên Îranê re derbas bû Şoreşek ku bi qurbanîdan û tekoşîna azadîxwazan li Îranê bi ser ket û dawî li desthilatdariya stemkar a paşayetî anî, rejîmek din bi serpereştiya Xumeynî hat ser desthilatê ku soza bidawîkirina zilmê li welat dabû û ew şoreş bi sepandina hikûmeteke olî dizî.**

**Şoreşa azadî, wekhevî û ji holê rakirina cudahiyên çînayetî, rejîmeke olî ku ji xeynî givaş, tepeserî û kuştinê ti zimanekî din nedizanî, hat ser desthilatdariyê.**

»»» R:6

# Doma daxûyaniya Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat

Xebatên bo 12mîn dewra meclisa şêwra îslamî di demekê de ye ku meclisê wek organa derbirîna xwast û îradeya gel nekariye li ser mijarên girîng ên têkildarî maf û jiyana xelkê Îranê biryarder û bandordar be, Belkî meclîs bixwe beşeke girîng a pêkhateya vê rejîmê bûye û weke yek ji organên sereke yên vê rejîma zordar rol lîstiye. Bi taybetî bûyerên Şoreşa Jînayê û berdewamiya tevgerên nerazîbûnê yên di heyama 2 salên derbasbûyî de, bo her kesî re îsbat kiriye ku ne parlamentoya rejîmê parlamentoya rasteqîne ye û ne jî nûnerên wê dengê xelkê û berevankarê maf û azadiyên wan e. Her kes dizane ku tenê di van 2 salên borî de, bi sedan kesên çalakvanên mafxwaz li kolanan hatin kuştin, bi deh hezar kes hatin binçavkirin, û nêzîkî 2 Hezar kes hatin îdamkirin, bersiva her cure nerazîbûn û mafxwaziyeke xelkê bi agir û hesin hatiye danê û belengazî, buhabûn û birçîbûn xelkên welat dagirtiye, lê belê ne meclîsê bi giştî û ne jî nûnerên wê meclîsê heta bi tak jî, ti helwesteke kêrhatî li hember cinayetên rejîma siyasî û desthilatdar li welat nîşan nedane. Yn jî dema ku Komara Îslamî ya Îranê li Rojhilata Navîn kirîzan çêdike, destêwerdanên siyasî di karûbarên navxweyî yên welatên cîran de û alîkariya milîs û komên terorîst ji bo îdeolojiya hinardekirina şoreşê li li ser hisaba serwet û samana giştiye welat û ser sifrika xelkê Îranê şerekî niyabetî digel Amerîka û hêzên hevpeymanan dest pêkiriye, meclisa Îranê û binav nûnerên xelkê li wê meclîsê de ne tenê li dijî siyasetên rejîmê nerazîbûn nîşan nedane, belkî di civîna mecîsê de cil û bergên Spaha Pasdaran li xwe dikin û wek leşkerên piyade nizama rejîmê li eniyên bi dijî xelkê tevdigerin.

Lewra Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi derbasbûyîyekî nêzîkî 8 dehkan xebat û qurbanîdan û tedbîr û helwestên siyasî, bi taybetî piştî şoreşa "Jin, Jiyan Azadî", û tundtir bûna rikeberiya di navbera xelkê û rêjîma komara îslamî, li ser wê baweriyê ye, ku baykotkirina hilbijartinên 11ê Reşemê ji derbasbûyî zêdetir erkekî niştimanî û neteweyî ye exlaqiye û di heman demê de xwedî derkevtin ji nêzî Sed sal xebata siyasî li pêxema maf û azadiyên gelê Kurd û ev xwîn û tekoşîn mîrateya tekoşîna kurd li Kurdistana Îranê ye.

Lewma PDKÎ daxwazê ji hemû gelên Îranê bi taybetî xelkê Kurdistanê dike ku ji bo berevanîkirin li maf, azadî, daxwazên mirovî û netewî, hilbijartinan baykot bikin û bi neçona xwe bo ser sindoqên dengdanê, vê hilbijartinê bikne referandumeke din û careke din ji Komara Îslamî re bêjin "na".

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) xatircem e ku xelkê Kurdistanê dê bi coşeke zêdetir van hilbijartinan baykot bike, lê belê tevî wê yekê jî daxwazkarê wê hindê ye hemû kes, pêkhateyên civakî, civaka medenî û rêxistinên cemawerî û bi giştî hemû aliyekê dinê digel hev biçne çepera baykotkirina hilbijartinên meha Reşemê û, dîmenekî dine ji yekitî, têkoşîn û berxwedana Kurdan nîşana her kesî bidin.Hev dem Hizba Demokrat pêşwaziyê li vekişandina wan kesane jî dike ku bi her sedemekê pêştir navê xwe ji bo hilbijartinan tomar kirine, lê amade nin xwe bikne şirîkê îxanet û tawanên rejîmê û wan karesatên ku bi ser xelkên welat de tîne.

Silav li îradeya şoreşgerî ya xelkê Kurdistanê û hemî azadîxwazên Îranê!

Silav ji mafxwazî û xebata şoreşvaniya we!

Bijî yekîtî û hevdengiya hemû neteweyên mafxwaz ên Îranê bi dijî Komara Îslamî!

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê **Navenda Birêveberiyê** **15 ê Şibata 2024 a Zayînî**

# Daxûyanî li derheq lidarxistina komcivîna berfireh a Rêberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

Di komvivîna herî nû a Rêberiya Hizba Dêmokrat a kurdistana Îranê de, tevî tekezî li ser hewcehiya yêkdengî û yêkrêziya qahîme hêz û aliyên siyasiye Kurdistanê û alîkariya bi kiryar a opozîsyonê ji bona derbasbûn ji komara îslamî, behsa wê yêkê jî hate kirin ku bona xistina qedemaye rêjîma komara îslamî û çêkirina Îranekî tena li pêşerojê de, li gireva parvekirina dêmokratîke deshilatê û bidestveanîna azadiyê, wekhevî û mafê berheqe hemî pêkhateyên wî welatî de ye.

Ev komvivîna Rêberiya Hizba dêmokrat a Kurdistana Îranê bi pişkdariya piraniya nêz bi tev endamê Rêberiya Hizbê bi armanca bas û berhevdana rewşa siyasiye Îranê û tevgêra rizgarîxwazane a Kurd li Kurdistana Îranê hate lidarxistin.Kombûnê bi ragirtina bîstekê bêdengî bona rêzgirtin ji yad û bîranîna Şehîdên Kurdistanê destpêkir, piştre rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî a PDKÎ hilsengandin û berhevdana siyasiye Navenda Birêveberiya Hizbê li derheq dawî guhertinên herêmî, Îran û Kurdistanê pêşkêş kir.

Piştî hingê berhevdana siyasiye Navenda Birêveberiya Hizbê ji aliyê endamê Rêberiya Hizbê ve kevte ber bas û şirove û rexne û nêrîn û pêşniyaran û hate dewlemenkirin û komek erkên taybet bi Navenda Birêveberiya Hizbê hatne spartin.

Komcivîna Rêberiya Hizbê bi amajekirin bi şer û aloziyên çend mehên derbasbûyî li Rojhilata Nawîn kir ku bi êrîşa Hemasê bo ser Îsraîl û berteka herî tunde wî welatî li Zîvala Xezê dest pê kir û niha bi tevdaniya milîsan û êrîşa wan hêzên niyabetî bo ser Îsraîl û berjevendiyên Amerîka li welatên herêmê de berfirehtir bûye, û rêberiya Hizbê komara îslamî bi sebebkareê serke yê kurbûna zêdetire pirskirêkan û ne tenahiya siyasî û ewlehiya Rojhilata Navîn zanî.

Kombûna Rêberiya Hizbê amaje bi vê yêkê da ku ne ev kavilkarî û vêraniya ku li Xezê de diqewime bo komara îslamî re girînge, û ne xema wî xelkê bêberevan de ye kû xwîn bi ser wan de dibare, belku eva ku bo rêjîma komara îslamî re girînge, afirandina pirskirêkên siyasî û ewlehî li herêmê de ye bi armanca mana xwe û ji bona derbasbûn li pirskirêkên navxweye welat ku pêsîra wê girtine.

Komcivîna Rêberiya Hizba Dêmokrat bi baldan bi hatina 22 yê Rêbendanê 45 emîn sala geheştina komara îslamî bi desthilatê, avir da wê yekê ku civatên xelkê Îranê di sala 1979 a Zayînî de daxwazkarê dêmokrasî, azadiya siyasî û wekheviya civakî bûn û vê armancê jî şoriş kirin heta ku dawiyê bi zordariya siyasî bînin û azadî û mafê medenî û dêmokratîk yên xwe bi dest ve bînin.

Lê em dibîni piştî 45 salan bi kiryar tenê cihê Şahenşah û Weliyê Feqîh hatiye guherîn û li jêr deshilata komara îslamî de çend qat zêdetir digel pirskirêkên weke belengazî, bê karî, bê mafî û tepeseriya xwast û daxwazên bingehîne xwe hember bûne.

Piskirêk û arîşeyên civakî yê dehan salî di demekê de ser hev bûne keleg ku komara îslamî di cihê baldan bi xelkê û çareserkirina pirs û daxwaziyên wan, heta niha sedan Milyard Dolar ji serweta giştiye welat bona siyaseta xwe ya tevdaniyê li herêmê de, teyarkirina milîsên curbicur bona şerê niyabetî û îdolojî û hêjmoniya xwe a siyasî xerc kiriye.

Lewma li destpêka 46 saliya temenê xwe de li nava civatgeha cîhanê de weke mezintirîn rêjîma piştevanê tirorîzma navdewletî û sebebkarê nehêminkirina herêm û dunyayê hatiye naskirin û li navxweya welat de jî rewayetiya herî kêm a siyasî heye û tenê bi zora çekê û tepeseriyê kariye deshilata xwe biparêze.

Komcivîna Rêberiya Hizbê li parekî diyê a bernama karê xwe de bi baldan bi birêveçona gera nû a hilbijartina meclisa şêvra îslamî û meclisa xêbrigana rêberî li meha Reşema Îsal de, li ser vê bawerê bû ku pêvajoya nerizayetiyan li yêk dehka derbasbûyî de bi taybetî piştî şorişa Jîna "Jin, Jiyan, Azadî" ve xelkê bi temamî qedera xwe digel de yêkalî kiriye û rêve birina maşkanêya hilbijartinan ne tenê nikare berjenga asayîbûna rewşa welat be û rewatiya nemayî bo vê rêjîma tepeserkar û mafpêpeske re vegerîne, lê bi xatircemî ve dê bibe derfetekî din li xebata mafxwazane a gelên Îranê û gotina "Ne" yekî din bi vê rêjîmê.

Bilind nirxandina xebata medenî û hişmendî û pêşkevtina civatgeha Kurdistanê ku li 2 mehên derbasbûyî de li 3 boneyên cuda cuda de gelek bi başî xwe îsbat kir, hewcehiya liser hev xistina hêz û şiyana xebatkariya Kurdan li Îranê, bihêzbûna opozîsyona komara îslamî û hewcehiya yêkitî û alîkariya bi kiryar a opozîsyonê bi armanca derbasbûn ji komara îslamî, çend mijarên dinêye basên siyasî û teşkîlatî, li komcivîna Rêberiya Hizbê de kevtne ber bas.

Komcivîna Rêberiya Hizba Dêmokrat a kurdistana îranê piştî xistina ber basê ye komek mijarên dinê ye navxwe û teşkîlatiyê Hizbê û biryar standina li ser wan mijaran, dawî bi karên xwe anî.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê
Navenda Birêveberî
Rêbendana 1402 a Rojî

# Çima xelkê Kurdistanê deng nade?



N. Serbest Urmiye




Dengdan wate îradeya welatiyan, bingeha peydabûna şaristaniyeta nû û avakirna hikûmetan e. Ji bo pesendkirina hikûmetê jî, dibe welatî rolê sereke di biriyarên siyasî û îdareya welat de wergirin û divêt ku destûr û yasayên hikûmetê di warên ewlehî û parastina mafên welatiyan de zelal bin.

Di vir de ye ku hilbijartin dibe emrazê sereke a welatiyan ji bo pesendkirina hikûmetê di hemû astên îdareya welat de.

Hilbijartin weke dahênan a nûjen û herî bi bandor a mirovahiyê tê nasandin.

Ji ber danezanîna taybetmendî, ragirtina biha û rûmeta mirov, wekhevî, serxwebûn, azadiya ramanê û parastina kesayetiya mirov e ku ji hilbijartinê weke bingeha avabûn û rêkxistina civakê tê mêzekirin.

**Di rastî de, pêvajoya hilbijartinê roleke girîng di civakîkirin û gelhezkirina desthilata siyasî, derêxistina rûmetê desthilatê, kontrol û diyarkirina hêza siyasî û dabînkirina maf û azadiyên welatiyan de heye.**

Ji ber vê yekê, her hewleke zanistî yan nerênî di vî warî de, bandora rasterast li ser civakê heye. Ji ber ku merem ji hilbijartinê parastina nirx û alîkariye bo geşekirina mirov, lewma mercê hebûna tenahî û ewlehiyê ye.

Ji bo ku sîstema hikûmetê li gor pîvanên demokratîk were berhevdan, divêt ku rêjeya beşdariyê di hilbijartinan de, radeya hilbijatina berbijêran, wekhevî û azadiya ragihandinê ji hemû civakê re, perwerdeya siyasî û civakî di hemû astên civakê de û bo hemû welatiyan

ewlehî û tenahî ya civakî û siyasî, hebûna aliyên siyasî û beşdariya azad di hilbijartin û îdareya welat de, werin kifiş kirin ku gel rêya hilbijatinê bigire pêşiya xwe. Ev eslên demokratîk ku gel di bin siya rejîma Îslamî di Îranê de jê bêpar in.

Li gor vê destpêkê û hilsengandina karnameya tarî ya rejîma Îslamî ya Îranê, xuya dibe ka çima gelê Kurd hertim pêşeng bûye di baykutkirina binav hilbijartinên rejîmê de.

**Gelê Kurd her ji despêkê ve û li ber hebûna fakter û eslên nedemokratîk ku di serî de hatine û hebûna dijberiyê tevî sîstemên nûjen ên şaristaniyê di pêkhateya bingehîn a rejîma Îslamî ya Îranê de, dengê "NA" da rejîmê û ev sîstem li dijî îradeya giştî ya civaka Kurdistanê da nasandin.**

Di kiriyar de jî sîstem û desthilatdariya Komara Îslamî ya Îranê çi caran dijberiya xwe bi gelê Kurdistanê re neveşartiye û dest ji çi kiriyaran di pêxema zevitkirina azadî û bêrûmetkirina jiyanê di Kurdistanê de, neparastiye.

**Lewma bo gelê Kurd beşdarî di her hilbijartinekê de ku ji aliyê Komara Îslamî ve were lidarxistin, tê wateya qebûlkirina sîstema vê rejîmê û li dijî îradeya giştî ya Kurdistanê tê hejmartin.**

Di hizra civaka giştî ya Kurdistanê de beşdarbûn di hilbijartinên vê hikûmetê de, bêrûmetkirina hest û kesayetiya takekesî û civakî ya mirov tê dîtin.

Gelê Kurd li hember rejîmê de hewil bo parastina şikomendiya siyasî, neteweyî, civakî û mirovahiya xwe daye û dide û di baweriya civaka Kurdistanê de ku hebûna rejîma Îslamî ya Îranê li gor pîvanên şaristanî û li ser bingehên zanistî pesend nekiriye

hebûna destûra rejîmê ya paşverû, temenê tejû ji tawanên li dijî mirovahiyê ji damezirandina vê ve heya niha, pîlanên nepenî di terzên cur bi cur de li dijî gel, yasayên mesebî û olî ku bûne sedema paşvemayîna civakê, siyasetên tepeserkar û şerxwaz him li hundir û him jî li derveyî welat

nebûna azadî, mafên mirovan û hebûna girtîgehên tijî ji girtiyên siyasî û azadîxwazên li dijî siyaseta çewisandinê, îşkence, îdam û çewisandina jin û zarokan, destwerdanên şerxwaz di herêmê de û terxankirina semyana welat ji bo bihêzkirin û berfirehkirina taqimên terorist û tundrew ên girêdayî bi vê rejîmê ve

ku di hizr û ramanên cîhanî de nayên qebûlkirin û ji hemûyan balkeştir ji beşdariya rasterast a berpirsên rejîmê di astên herî bilind de di tepeserkirin û kuştina xelkê mafxwaz û azadîxwazên dijberî siyasetên rejîma Îslamî di welat û nemaze di Kurdistanê de


destûr wergirtina rasterast a dezgehên dadwerî, Wezareta ewlekarî û hêzên leşkirî ji rêberê rejîmê bo serkutkirina gelê Kurd Şorêşa "Jîna" yê mînaka herî teze ya kuştina gel û hovîtiya rejîma Komra Îslamî ya Îranê di Kurdistanê de ye

beşdarbûn di her hilbijartinekê ku di vê rejîmê de tê lidarxistin, di rastî de ji bilî bihêzkirina rejîmê li hember gel de, çi tiştekî din nahê hijmartin.

# Opozîsyona rêjîma Îranê naxwaze pirsa kurd û gelên din qebûl bike



**N. Azad Kurdî**



Bi şorişa pêkhateşikên a "Jîn,Jiyan Azadî" bi pêşangiya gelê Kurd, êdî desthilatdariya rêjîma Îranê bi dewrana pêş şorişa Jîna û piştî şorisa Jîna gav avêtiye.

Çi tiştek weke berê nemaye. Desthilatdariyeke dîktator û hov ku bingeha wê li ser xwînrijandin, lidarvekirin, îşekence û girtin û pêkanîna tirs û xofê heta 45 salan kariye temenê xwe bidomîne.

Lê êdî ev heybet nemaye û viyan û îradeya gelên nav cografiyaya Îranê vejiyaye. Azadî, demokrasî û wekhevî û mafên rewa daxwaz û armanca rojev e.

Ligel ku bedel û qurbanî gelek hatine dayîn di yek sala borî de, lê ev yek bo ferzkirina îradeya azadîxwaziyê ya gelan bû bi ser tarîtî û nîrê zordariya desthilata xedar.

**Yek ji fakterên mayîna rêjîma Îranê li ser desthilatê heta niha, nebûna opozîsyoneke bihêz û yekgirtî ye bi hemû pêkhateyan, helbet ji xeynî Kurdistanê. Di wî warî de rewş li Rojhilatê Kurdistanê cuda ye ligel hemû Îranê.**

Li Rojhilatê Kurdistanê ligel hemû tedbîrên rêjîmê bona dûrxistin û lawazkirina hêzên bi bandor ên Kurdî ji Rojhilata Kurdistanê, lê peywendiyên zindî yên gel û partiyên siyasî, rêjîm sergêj û matmayî kiriye.

Ji ber ku ev peywendî dîrokî û civakî ne, bi çi zext, zordarî û pîlanên ewlekarî û tund û tûjiyan nayên qutkirin.

**Bingeha vê yekê dîrokî ye û selimandiye ku kurd bona rizgarî û bidestveanîna mafên neteweyî û wekheviyê xebatê dikin û xwediyê dozeke rewa ne û bêy çareseriya pirsa Kurd, gelê Kurd qet dest ji vê doza rewa bernedaye û bernade. Mînaka berçav li cade û kolanên Kurdistanê di îradeya gelê Kurd de li şoirişa Jîna yê de hate nîşandan.**

Îran welatek e ku ji çend netewe û zimanan pêk tê. Fars, Turk, Kurd, Ereb, Belûç, Turkmen, Gîlek û … pêkhateyên wî welatî pêk tînin.

Bêy qebûlkirina vê pirrengî û pirneteweyîbûnê di qanûna bingehîn de bi awayekî fermî, qet pirsgirêk çareser nabin. Bi derbasbûna demê û bi siyasetên înkar, zilm û zordariyên her du rêjîmên Pehlewî û Îslamî yên Îranê meşandine, navber zêdetir bûne û daxwazên gelan jî radîkaltir bûne.

Navber ji wê demê destpê kirin ku li her du welatên Turkiyê û Îranê, Ataturk û Rizaxan bi pêkanîna reforman, xwestin civakê modernîze bikin !!! Projeya wan ya sereke avakirina sîstemekê bû bi yek Al, ziman û netewe, bêy berçavgirtina pêkhateyên her du welatan.

Ev yek bû bingeh û destpêka pirsgirêkan ku heta niha li Îran û Turkiyê bê çareserî mane. Di vî warî de em dibînin ku cudayiyek di navbera desthilat û opozîsyona seranserî de nîne di van du welatan de.

Bi destpêkirina şorişa Jîna, beşeke sereke ya opozîsyona rêjîmê li derve selimandin ku di pirsa nasandina pirsên neteweyên nav cografiya Îranê de, siyaset û helwêstên wan ferqek digel rêjîmê nînin.

**Dixwazin pirsa kurd û gelên din di çarçoveya mafên hevwelatîbûnê de kurt û kêm bikin. Qet amade nînin di çarçoveya lihevhatineke destpêkî û piştre qanûna bingehîn de mafên wekhev bon hemû gelan bi fermî nas bikin.**

Kurd û gelên din daxwaza pêkanîna sîstema fêderal li ser bingeha neteweyî û cografî dikin, çi aliyek hazir nine vê sîstemê qebûl bike.

Hêzên ku baweriyên wan bi dêmokrasî û bingehên dêmokratîk hebin, vê yekê bi hêsanî dikarin bipejirînin.

Rewşa vê dawiyê da xuyakirin ku evhêz hêşta xwe ji bingehên dîktatorî, faşîzm serdestiyê rizgar nekirine û ne jî bêhnek ji demokrasiyê kirine.

Dêmokrasî bingeha çareserkirina pirsgirêkên wiha ye.

Heta maf û azadiyên gelên ku di çarçoveyeke cografî de dijîn, bi fermî û di qanûna bingehîn de neyên pejirandin, pirsgirêk qet çareser nabin.

Ger mirov bala xwe bide welatên Swîs, Beljîka û Kanada ku xwediyên pêkhateyên netweyî yên cuda ne, bi pêvajoya bifermînaskirina civak û ziman û neteweyên cuda di çarçoveya qanûnên bingehîn ên wan welatan de, pirsa neteweyî heta asteke baş çareser kirine.

Her neteweyek di çarçoveya cografiya xwe ya diyarîkirî, rêveberiya xwe dike û welat jî bi vê sîstema fêderal baştir rêve diçe.

Kurd û gelên din jî divê heta bifermînaskirina mafên xwe di qanûna bingehîn de xebatê bikin.

# Dar li ser koka xwe, mirov li ser zimanê xwe şîn dibe



N. Elî Munezemî




Her Gotinek pêşiyan ku bi gelemperî û hêla gelek kesan ve tê gotin û zanîn, li hevokên kurt û wateyek kûr pêk tê, Ew gotin encama tecribe û ezimûnên dûr û dirêjin. Ew gotina pêşiyan ya bo sernivîsa wê gotarê hatiye danîn, ji ber 21ê Şibatê "Roja cîhanî a Zimanê Dayîkê" ye. Ez dixwazim di vê gotarê de behsa girîngiya zimanê me yê Dayîkê bikim.

Li ber ku faktora herî girîng a netewebûnê ziman e û eger kurd li zimanê xwe xwedî dernekevin, yê Kurdistan û kurd bi hev re li dest me herin. Tam ber wê rastiyê e dijmin hemû cehda xwe dikin ku bi rê û metodên cihêreng, kurdan li zimanê wan veqetîne û ewan di nava neteweyên serdest û dagîrker de bipişivînin û asimîle bikin.

Ziman hêmana herî girîng e ku me ji yên din vediqetîne û nîşan dide ku em neteweyek cuda ne.

**Rewşenbîr û rêberên kurd ew rastiya han fam kiribûn û li ber wê hindê jî bo parastina zimanê kurdî xebatek mezin û bêhempa heta îro meşandine û hindek ji wan rêber û rewşenbîran, parek mezin a jiyana xwe feda kirine ku bikaribin zimanê me biparêzin. Li ber ku xebat û doza serxwebûn û azadiya netewe û welat li xebat bo parastin û pêşvebirina ziman cihê nîn e. Yanî ziman hebûn û jiyan e.**

Berevajî wê yekê jî dikare rast be. Yanî ew kurdên ku li ser parastin û xwedî derketin li zimanê xwe ciddî û pêdagir nebin, ew di xizmeta pîlan û bernameyên dijmin de ne bo hilweşandin û wêrankirina neteweya kurd. Ew dibin sedem ku dijim hêsantir bernameyên xwe bo pişavtina kurdan cîbecî bikin û me bo aliyê nemanê ve bibin.

Her neteweyek li cîhanê bi zimanê xwe tê naskirin. Yanî ziman perçeyek mezin û girîng a nasnameya me ye. Eger em nekarin zimanê xwe biparêzin, em nikarin kurdbûna xwe îsbat bikin. Eger em kurdbûna xwe jî nekaribin îsbat bikin, em nikarin bêjin ku Kurdistanek jî heye.

**Pispor dibêjin ku "ziman û hizrkirin wek hev in", "ziman bingeha hizrkirina meriv pêktîne", "hizrên meriv bingeha pêşketina zimanê meriv e" û zaf gotinên din. Yanî ewên ku li perwerde bi zimanê zikmakî tên bêparkirin, ew tinê li nasnameya xwe ya neteweî nayên bêparkirin û tinê nasnameya wan nayê wêran kirin.**

Belkû şêweya hizrkirin û ramana wan jî tê wêran kirin û ew li têgihîştinek kûr li wateya hevokan jî tên bêpar kirin û hilkişyana wan li pêlekana perwerdehiyê de zehmet dibe.
Ewa ku zaf zarokên kurd li sîstema perwerdehiya rejîmên dagîrker de li xwendingehan direvin û naxwazin herin mektebê, li wê rastiyê ve serçave digre.

Zimanê Dayîkê kilîta deriyê dil e. Nelson Mandela dibêje: Ger tu bi zimanekê ku kesek jê fam dike pê re biaxivî, ew dikeve serê wî.

Lê ger tu bi zimanê Dayîkê pê re biaxivî, ew dikeve dilê wî." Her merivek bi zimanê xwe yê Dayîkê dikare hêsantir li her zimanek din hest û ramanên xwe bîne ziman, kultûr û edetên xwe nas dike û bi civaka xwe ve tê zeliqandin û girêdan.

Gelo çima hinek li dijî zimanê Dayîkê yên hinekan in?
Hûn dizanin ku 21ê şibatê bi hêceta pêşxistina cihêrengiya zimanî û pirzimanîyê, zêdekirina têgihiştin, tolerans û diyaloga di derbarê kevneşopiyên zimanî û çandî wek roja cîhanî a zimanê Dayîkê hate destnîşankirin.
Ewên ku dijberiya zimanê Dayîkî dikin, di hember wê armanca mirovî derdikevin. Li ber wê armancê bi zerera xwe yan neteweya xwe dibînin.

Ew bo gihîştin bi wê armancê li metod û şêveyên cuda cuda mifahê werdigrin û dixwazin bi wan rêyan û argumentkirin û hegeranînên nerast û jîranenîşandana wan hegeran, kum bidin serê xelkê û wan bêxin xizmeta raman û armancên xwe yên nemirovane û şovînîstî.

Dibe haya me li wan mesela hebe û em îznê nedin wan cure kesan. Armancek ku rêkxistana neteweyên yekbûyî li ser bingehek dadperwerane û mirovî destnîşan kiriye, nikare xelet be.

Kesek ku nekare hurmetê li zimanê kesekê din re bigre û wê wek hereşe û tehdîd bibîne, nikare bi wî re hemjiyanek aştiyane di hundirê welatekê de ava bike.

Hemjiyan girêdayî bi girtina hurmeta dualiyane ye.
Ewê ku bixwaze zimanê me tune û winda bike, eger destê wî bê, yê serê me jêve bike.
Ber hindê jî em nabe îznê bidine kesê ku di hember perwerdeya bi zimanê Dayîkê û vegeşandin û pêşxistina wê bisekine û li hêlek din jî basa hemjiyanê di welatekê de bi me re bike.

Roja cîhanî a zimanê Dayîkê li hemû zarokên emegdar û neteweperwer û zimanhezê kurd pîroz be!

Spas bo hemû wan kesane ku bo pêşveçon û vegeşiyana zimanê kurdî ked dane û zehmet kişandine!

# Rejîma Îranê ev 45 sal in ku nekariye dengê azadiyê li Îranê de bifetisîne



**N: Mojgan Elîpûr**
W. HESEN MUKEREM



22'ê Rêbendana îsal 45 emîn sal bi ser şoreşa gelên Îranê re derbas bû Şoreşek ku bi qurbanîdan û tekoşîna azadîxwazan li Îranê bi ser ket û dawî li desthilatdariya stemkar a paşayetî anî, rejîmek din bi serpereştiya Xumeynî hat ser desthilatê ku soza bidawîkirina zilmê li welat dabû û ew şoreş bi sepandina hikûmeteke olî dizî.

Şoreşa azadî, wekhevî û ji holê rakirina cudahiyên çînayetî, rejîmeke olî ku ji xeynî givaş, tepeserî û kuştinê ti zimanekî din nedizanî, hat ser desthilatdariyê.

Desthilatdarên Tehranê di demek kurt de rûyê xwe yê rastîn eşkere kirin, cudaxwaz û azadîxwaz avêtin hepsan û maşînên xwe yên kuştinê rêkxistin. Di 6'ê Reşemeya 1357'an Rojî de Yasaya Piştgiriya Malbatê hat betalkirin û di 16'ê Reşemeyê de fetwaya hicaba bi zorê hat dayîn.

Wê rêjîmê her di destpêkê de dijberiya xwe bi dijî maf û azadiyên jinan ragihand, ku bû sedema yekem xwepêşandanên mezin ji aliyê jinan ve piştî hatina Xumeynî, ku di 8ê Adara heman salê de ji xwenîşandan bo redkirina fetwayê hefteyekê hat lidarxistin.

Lê jin di xwepêşandanan de bi tenê man û hêzên tepeserkar ên rejîma Îranê ew vegerandin malên wan û piraniya organîzatorên xwepêşandanan hatin girtin û bêserşûnkirin.

Gelê Kurd weke yek ji neteweyên Îranê ku xwedî dîrokeke dirêj a têkoşîna bona rizgariyê bû û di serkeftina şoreşê de jî roleke berçav hebû, çavnhêr bû ku para xwe ji şoreşê werbigire û bigihîje mafên xwe yê netewî. Lê mixabin rejîma Îranê ev maf û azadî nas nekir û di 28'ê Gelawêja sala 1358'a Rojî de Xumeynî fetwaya cîhadî li dijî neteweya Kurd derxist. Berevaniya qehremanane ya Hêzên Pêşmerge, rejîm xistine qedema û ji ber nebûna yekrêziya hêzên siyasî, gereke din a danûstandinan ji bo mafên gelê Kurd bi Tehranê re dest pê kir.

Hêcetên rejîmê ji bo nedana van mafan bi ser neketin û ji wê demê ve gelê Kurd li hember dîktatorên Tehranê rawestiyaye û ji bo rizgariya xwe xebatê dike.

Rast e netewên Kurd û Belûç rastî tundûtûjiyên herî zêde ji aliyê hikûmetê ve hatine, lê ev yek ne tenê ji bo neteweya Kurd bû, belku ji bo hemû kesên ku ji xeta rêberê rejîmê dûr dikevin û xwedî bîr û baweriyên cuda ne.

Mînaka berçav MîrHusên Mûsewî, serokwezîrê berê yê Komara Îslamî ye ku di hikûmetê de bû, lê di sala 1388 an de ku wek nerazîbûnekê li dijî encamên hilbijartinên serkomariyê dest pê kir, hate binçavkirin hîn jî di hepsa malê de ye û hezaran alîgirên wî bi tundî hatne tepeserkirin.

Ew dilopek in di nav deryaya tawanên rejîma Îranê de ku ji bo mana xwe her tiştî dikin, Ji holê rakirin, kuştin û birîndarkirin bûye nasnameya rejîmê. Ji destpêka desthilatdariya olî ya Îranê ve, ji bilî şerê 8 salan di navbera Îran û Iraqê de, ku atmosfereke ewlekarî û aloz bû, li gelek deverên Îranê xwepêşandan hatin lidarxistin, her çend ev tevger hemû hatine tepisandin jî, lê nehatine temamkirin û li cihên din û ji demên din berfirehtir derketine holê, ji ber ku piraniya van tevgeran xwedî rehên dîrokî ne û beriya desthilatdariya dîktator hebûne, lê li Îranê di bin desthilatdariya Komara Îslamî de, ji ber ku destûr nayê dayîn ku rêxistinên siyasî werin avakirin, ev daxwaz bi awayên cuda derketine holê.

Her çend tevgera rizgarîxwazî li Îranê xwedî dîrokek zêdetir ji sed salî ye, lê di 78 salên derbasbûyî de bi avabûna Komara Kurdistanê bi şêweyeke moderin pêş ve çûye, lê belê weke di warên din de, çalakiyên vekirî yên Kurd li Îranê jî ne mumkin bûye û weke ku li jor hate gotin, her çend aliyên Kurdistanî rêya aştî û diyalogê girtin bera xwe, lê Komara Îslamî ya Îranê şer û kuştin hilbijart û dest ji çi cinayetekê neparast.

Pêywendiya nêzîke partiyan bi gel re û zindîbûna tevgera siyasî li rojhilatê Kurdistanê bû sedema damezrandina çend rêxistinan di warên cuda de di qada ewlehiyê de ku li Kurdistanê serdest e, Ji bo parastina ziman, çand û jîngeha Kurdistanê li rojhilat gelek qurbanî hatin dayîn.

Tevgera jinan ku dîroka wê vedigere bo serdema Meşrûte ya Îranê, û bona azadiya cih û warên jinan pêş dikevt û pêngav dihavêtin, lê bi hatina Komara Îslamî re bi temamî berevajî bû. Dayikên Edaletê, Çarşemên Spî, di cihên aram û ... hwd bûn.

Ev mesele ji bo jinên kurd, ji komara Kurdistanê û avakirina rêxistinên jinan, kevntir bû, lê belê bi şoreşa gelên Îranê û bi çewisandina azadiyan, hinek ji wan tevlî partiyên Kurdistanî bûn. Gelek ji wan li Rojhilatê Kurdistanê bi xwe ev têkoşîn bi rêya rêxistin û gelek caran kesên di warên çandî, wêjeyî û zimanî de pêş xistin. Piştî Şoreşa Jînayê dayikên şehîdan bûne sembola berdewamkirina vê têkoşînê li Kurdistanê.

Bizava xwendekarî ku yek ji tevgerên herî geş di civaka Îranê de ye, hertim nûneratiya daxwazên sivîl û siyasî yên xelkê kiriye û zanîngeh û xwandingeh kirine çepera berevanîkirin ji bo bidestxistina mafên xwe. Karker, mamoste, malinişîn û ... hwd., yên ku bûne norma rojane, ji bo daxwazên xwe her tim li kolanan in, berdewama van daxwaz û xwenîşandanan tevî givaşên rejîmê, nîşana cehda Komara Îslamî ya Îranê li hember xelkê ye û siyasetên tundûtîj ên wê nekariye dengê azadîxwaziya Îranê bifetisîne. Berevajiyê vê yekê, em şahidê yekrêziya dengê azadîxwazan di şoreşa Jînayê de bûn, ku bû ezmûnek hêja ji bo gelên Îranê ji bo derbasbûn li rejîma dîktator.

## Nerîna



**"Mesrûr Barzanî":**

**"Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ji NBC re got: "Cewherê metirsiyan hatiye guhertin. Em di wê baweriyê de ne ku pêwîstiya me bi hevkariyeke zêdetir di warê leşkerî, aborî û siyasî de heye ji ber ku kêşeyên ku em rû bi rû ne cuda ne."**



**"Anthony Blinken":**

**"Wezîrê Derve yê Amerîka Anthony Blinken got ku Îran gefa herî mezin e li ser ewlekariya Îsraîlê û "me hemûyan" û divê ligel alîgirên xwe were îzolekirin. "**



**"Benjamin Netanyahu" :**

**"Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu roja Şemiyê ragihand ku danûstandinên ji bo gihiştina rêkeftina agirbestê û azadkirina dîl ketine bêçaretiyê û Îsraîl li ser planên xwe yên êrîşa bejayî bo ser Refahê berdewam e"**



**"Vladîmîr Pûtîn":**

**"Serokê Rûsyayê got: Her tiştê ku di derbarê Ukraynayê de diqewime ji bo Rûsyayê wekî meseleya jiyan û mirinê tê hesibandin, lê çarenûsa Ukraynayê ji bo Rojava ne girîng e û her tişt bi pozîsyonên taktîkî vedigereqebûlkirin"**

# Ew nikarin mafên me bistînin, em jî dengên xwe nadin wan!



**N. Eskender Ceiferî**



Parlamenterên Urmiyê, hem ên Kurd û hem jî ên Azerî, her ew kes in ku li Meclîsa Îslamî ya Îranê de qet nikarin mafên netewî yên Kurd û Azeriyan bistînin. Ji bilî wê ew li ser wêrankirina malên kesên ku bi zêderûyî ew mal çê kirine, dengê erê didin, Bêy ku ti çareserekê ji pirsgirêkê re bînin. Ev jî nîşan dide ku parlamenterên rêjîmê, ne pirsgirêka neteweyên xeyrî fars çareser dikin û ne jî pirsgirêka hejaran.

Hilbijartin nêzîk dibin û belkî hinek ji wan kesên ku têne xapandin, careke din dengên xwe bidin wan. Ji xeynî wan, wêrankirina malên Kurdan, stratêjiya bingehîn a rêjîmê ye û rêformîst û tondgir, hemû li hemberî Kurdan wek hev in.

Hesen Rûhanî du caran li ser kursiya desthilatê bû. Tevî ku slogana wî rêform bû, lê nekarî tiştekê biguhere. Ew jî li ser siyasetên dewletên berê dimeşe, Ji ber ku qet nikare yasaya bingehîn a Komara Îslamî û siyasetên giştî biguhere.

Çar salên wî yên duyem jî bi dawî hatin û Îbrahîm Reyîsî bû serokkonar û pêleke din a givaşê li ser welatiyên Kurd di rê de hat. Ne tenê girtîgeh ciyê Kurdan e belkî mal û milkên wan jî rastî zewtkirinê tên.

Hem mal û milkê girtiyên Kurd û hem jî malên wan welatiyên Kurd ku ji ber hejariyê bi zêderûyî hatine çêkirin, yan têne wêrankirin û yan jî têne zewtkirin.

**Beriya niha piştî destpêkirina çarsalên Reyîsî, mala yekemîn welatiyê Kurd li Urmiyê hatibû wêrankirin. Islamabada Urmiyê ku zêdetir bûye cihê hejar û kêmdahatan, qet nabe xwediyê bûdceyeke taybet ji bo avedankirinê. Welat rengê bajar bi taxên xwe ve nabînin lê li wir ne encumena gundan, belkî şaredarî heye.**

Ji ber kêmdahatbûn û hejariyê, welatî bi neçarî, malên xwe bê standina derfeta avakirinê ji şaredariya Urmiyê yan jî ji saziya Avakirina Malan û Endazyariya Malan, çê dikin.

Di rojên destpêka gerra serokkomariyê ya Reyîsî de hêzên şaredariya Urmiyê bi skorta hêzên polîs, mala karkerekî Kurd li Islamabada Urmiyê wêran kirin.

Heman çarenivîs, li benda welatiyên din ên kêmdahat e eger dengên xwe bidin berbijêrên rêjîmê ji bo parlamentoyê. Êdî divê ew dengê xwe yê nerazîtiyê hildin û hilbijartinê jî tam baykot bikin. Ji ber ku ew berendam, eger Kurd be yan jî Azerî be, tenê di xizmeta rêjîmê de ye.

Bi vî karê dewleta Reyîsî, wate bi rûxandina malên Kurdan, ne dengê rêformxwazên Kurd derket ku basa azadiyê dikirin û ne jî kesek derket xwepêşandanê. Parlamenterên Kurd jî weke hemû kiryarên gemar ên rêjîmê xwe bêdeng kirin.

Sedema ku xwepêşandan nehatin kirin jî ew bû ku her kes dizane eger di meşên girseyî de bê girtin, yan dê bi tometa şerê li dijî Xwedê rastî darvekirinê bê yan jî bi tometa hewldan li dijî ewlehiya netewî, dê bi girtineke demdirêj bê sizakirin.

**Ji dema destbikarbûna Îbrahîm Reyîsî ve wek serokkomarê rêjîmê, rêjeya darvekirinê li Îranê û Kurdistana Rojhilat jî zêde bûye. Ji wê demê ve heya niha bi sedan welatiyên Kurd hatine darvekirin û bi dehan kesên din jî bi darvekirinê hatine cezakirin.**

Ew jî ji bilî şehîdkirina sedan serhildêran di şoreşa Jînayê de ye.

Ew zarokê ku ji ber sermaya sibehên Urmiyê xewa şirîn nabîne, nizane ku Komara Îslamî jî Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan îmze kiriye ku li gor wê Danezanê, Jiyan, azadî û ewlehiya kesanî, mafê her mirovî ye.

Li gora benda 13 ya wê dazanê, Mafê her kesî heye ku di nav axa dewleteke de bi serbestî rêwîtiyê bike û devera ku lê bicî bibe, ji xwe re hilbijêre.

Mefê her kesî heye ku ji welatekî derkeve û carekî din vegere wî welatî. Lê ew kesê ku dewleta Reyîsî mala wî xira kir, ne çûbû welatekî din û ne jî mêvan bû.

Karkerek bû ku li ser axa bav û kalan ji xwe re xaniyekî biçûk ava kiribû û bi kar û xebata rojê, nanê şevê dikirî û debara jiyanê dikir.

Yasaya xirakirina malên ku bi rengekî neyasayî û bi zêderûyî hatine çêkirin, bêy ku guh bide rewşa aborî ya xwediyê malê, tê bicîkirin.

Li gor xala 100em a yasaya şaredariyan li Îranê, ew xaniyên ku bi zêderûyî li ser erdên giştî hatine çêkirin, têne wêrankirin.

Lê wê yasayê qet basa wan kesan nekiriye ku bi pereyên xwe, erd ji saziya Ewqafê kirîne û niha jî, ji ber ku erdên wan di pilana berfirehkirina riyan de ne, têne xirakirin.

Ew welatî qet nayên qerebûkirin. Nişteciyên piraniya wan navçeyan jî, hejar in. Tevî ku ti sermayeyeke wan jî tine ye, nizanin derbasiya jiyanê li kuderê bikin.

# Tu jî were lez bike



N: Hesen Mukerem



Rojek li rojan hevalekî berdewam ji hevalê xwe yên din re digot: ger ez rojek hînî avjeniyê "melevanî" bibim êdî ti carî li hişkaniyê namînim, ji ber ku tenê di nav avê de îhsas bi azadiyê dikim wir sînor nînin. Xwezî mirovan jî wek masiyan bask hebûna û di nav avê de bijiyana.

Hemû carê jî hevalên wî henekên xwe pê dikirin heta rojek birayê hevalekî wî li sînor bi guleyên leşkeran hatibû kuştin û birayê wî nedikarî nêzî terimê birayê xwe bibe û koçikan li ber çavên wî û bi bê tirs û nêzbûna wî hevalî ev terimê birayê wî parçe parçe dikirin.
Wê demê axavtinên wî hevalî yên li derheq avjeniyê "melevaniyê" ketin bîra wî û fam kir ku mebesta wî hevalî çi bûye.
Niha rewşa me û xwefiroş û dagîrkerên kurdistanê jî wisa ye.

**Dagîrker hin welatiyên nefis nizim yan hemen xwefiroşan bikirê digire û wan li hember pêşmerge û xebatkarên rizgariya kurdistanê dide hember hev û wan berdide canê hev.**

Heta di dema berxwedaniya ji bona parastina nîştiman de ku şoreşger an pêşmergeyek şehîd dibe, malbat an xwediyê cangorî ji ber xwefiroş û kirêgirtiyên dujimin nikarin terimê mirovên xwe werbigirin.

Yan xebatkarên ku bi destê xwefiroşan ketine hepsan de û tên bidarvekirin dîsan termê wan radestî malbatên wan nayên kirin û di cihên nediyar de tên veşartin.
Dagîrker gelek bi hişyarî û bi zanebûn welatiyên xapandî an hemen xwefiroşan di nav xaka kurdistanê de li hember hêzên partiyên kurdî û xelkê xebatkar û welatparêz de rû bi rû dike.

Ev kiryara qirêj a dagîrkerê kurdistanê jî bo vê hindê ye ku di dema bertek an givaşên navneteweyî yên li derheq qirkirina kurdan de dibêje min ji bo vê xakê xwîn rijandiye, herçend ku kuştina mirovê kurd bo dagîrker negirînge û kurdan bi destê kurdan dide kuştin lê wirda dijmin rijandina xwîna kurdan bi destê kurdan bo berjenwendiyên xwe mifahê werdigire û wiha rewatiyê dide bi cinayetên xwe li ser xaka Kurdistanê û zeftkirina xaka kurdistanê.

**Dagîrker bi başî dizane ku mirovê ku pişta birayê xwe ber dide û di xirabitrîn rewşan de îxanetê ji birayê xwe dike dê bo wî jî herwisa be û ji ber vê jî dijmin tucarî baweriyê bi wan kurdên xapandî nake û tenê bo barjewendiyên xwe û rewatî dan bi hovîtiyên xwe van bikar tîne.**

Herçawan me di 22ê Rêbendanê de dît ku di hin navçên Kurdistanê de ku heta duh milîtarîze dikir û jiyan di bajêrên kurdistanê de asteng û dijwar kirbû lê niha festîvalên hunerî lidar dixe, ev jî bi rêya kirêgirtiyan û navendên hikûmetî ve û bi wî avayî dixwaze her tiştî bi baş û asayî li Kurdistanê de bide xuya.
Lê tevî wan hemû givaş û cinayetên ku Komara Îslamiya Îranê li derheq gelê kurd li ser xaka kurdistanê encam dide, nabe em bivêrî û cesûriya xelkê nîştimanperwer û mirovdost ê kurd ji bîr bikin.
Xelkê nîştimanperwer û rizgarîxwaze kurdistanê bi bê hebûna tirsê li hovîtiyên dujimn û bêtirs li sînor derbaskirinên dujimn bona afrandina hovîtiyan li termê cangoriyên xwe yên bi destên desthilatdarên Komara Îslamiya Îranê qewmîne, xwedî derdikevin van bi coş û bi girse oxir dikin û van dispêrin bi xaka pîroz a kurdistanê.
Civîn û girseyên kurdistaniyan ji her kesî re didin fam kirin ku dibe mirov pêbendê wan sînoran bin ku rewş û serdem bo me diyarî dikin çawan ku demsala Zivistanê bi gef xwarinan ji me re dibêje ku eger hûn cudahiya di navbera min û demsalên din de nebînin xatircem bin ku ezê we bi sir û seqemê bicemdînim.

Mirovên nefis nizim an hemen xwefiroş jî dibe vê yekê bizanibin ku dê bên cemdandin.

Mirov bi dîtina dîmenên girsey yên xelkê nîştimanperwer bo oxir kirina cangoriyan hem bona yekdengî û piştevaniya wan pirr keyfxweş dibe û hem jî bêxem dibe ku li hember vî dîwarî ku heta niha gelek kesan wek tirs û xof jê temaşe dikir, lê kurdistaniyan ev dîwar şikandiye û jê derbas bûne, û ji her kesî re dane famkirin ku ciwantrîn mirin ev mirine ku li pêxema bawerî û armancên neteweyî yên xwe de ye, ji mirovên nefis nizim re dibêjin werin hûn jî lez bikin bila pare nemînin.



# TRAWMAYÊN KURDAN MEZİN İN, LÊ DİSA JÎ RADİBİDİN Lİ SER PÎYA



N: Kofîxwar

Di derûnnasiyê de “trawma” ji ber bûyerên nexêr û nebaş yên ku li ser mirovan, qewman, koman, neteweyan qewîmine û di encamên wan de hilweşandina, hejandina derûniya însanan tê rave kirin. Heger mirov bi dilê xwe li dij bûyerên nêxêr û nebaş bertekên di cî de bê dayîn nedabe, li dij wan lawaz ketibe, hewl daye lê dîsa jî hêz û keda wî têra ji holê rakirina bandora xirabiya derûniya wî nebûye hêza wî têra çareserkirina pirsgirêkan nekiribe, di dawiyê de bêhêz dikeve û xwegiramiya wî ji holê radibe.

Yeko yek însan ji ber trawmayan ji kesayatiya xwe, kok/eslê xwe ji derdor û malbata xwe dûr dikeve. pêwendiya wî li gel xwe, nas û qewman xera dibe. Bi vî awayî dixwaze xwe ji xirabiyan rizgar bike, lê nabe. Her diçe dibe mirovekî eletewş. Dixwaze Sedemên trawmayan ji bîr bike, belam nabe. neçar dimîne bandor û sedemên trawmayan diavêje di binhişê xwe. Êdî xwe jî nizane çi hatiye serê wî, wê çi bibe. Her û her ji dûrî rastiya xwe, hebûna xwe dimîne. Tu carî naxwaze bi trawmayan ve rû bi rû bimîne. Naxwaze tu kes ji wan bi bîr bîne, ji wî re qala rabûrdiya wî bike û bi ser de carinan xwe aidî komele, çand û dîroka xweyîyên trawmayan hîs dike. Dibe heyranê zordestên xwe , tim û tim pêsnên wan dide.Xwe piçûk û wan mezin, xwe bêhêz, wan bihêz dibîne. Ji xwe pitir ji wan hez dike. carinan jî di rastiyê de hem bi fîzîkî hem bi giyanî xwe dike qurbana wan. Dikeve di bin xizmetên wan, bi wan re xûlamîyê dike. Nasnameya xwe ya serbixwe wenda dike. Êdî nexweşekî derûniyê ye, pêwiste bê pak kirin. Heger nebe dibe, yarê zordest neyarê xwe. Mirovên ji ber trawmayan nexweş ketiye tim û tim di metirsiyeka mezin de dijîn. Tim û tim ditirsin ku wê carekê dîsa trawmayan ve rû bi rû bimînin. wê dîsa bûyerên xirab û nebaş bêne serê wan. Ew tirs her diçe mirov nexweş dixîne. Lewma mirov ji kesayetî û hebûna xwe dûr dikeve û pirtir dikeve di bin zexta zordestên xwe.

Kurd tim li her perçeyên Kurdistanê ji ber jenosîda bi her aliyî , bi her awayî hem fîzîkî hem derûnî trawmayên bê terîf , bê şirove ve tim rû bi rû mane û diminîn jî. Bi saya însanetiya xwe, bi saya çand û dîroka xwe bi saya jenetîka xwe li ser pîya mane, kêm kesên wan nexweş ketine, ketine di bin zexta zordest û neyarên xwe. Birinê hev pêçandine jiyana xwe domandine. Şîn û şahiyên wan bûna birayên hev. Gelek caran derfeta wan nîn bûye ku şîna hezkiriyên xwe jî bikin. Lê her û her serê xwe rakirine, li dijî neheqiyê, li dij neyarên xwe derketine. Dev ji doza xwe ye serbixwe bernedane. Dibe ku li seranserê cihanê kêm netewe hebin an tunebin ku tuşî ewqas nebaşiyê bibin lê disa jî serbixwe bimînin. Ew rewş hejayî nirxandinê ye.



Bes mixabin divê careke din bê dûbare bikin, kêm kesên kurdan ji ber trawmayan nexweş ketine, ji nasname û hebûna xwe dûr ketine. Bûne heyranên neyarên xwe. Hez jî neyaran dikin. Dibin dijminê eslê xwe, anku kurdan nin. Pê de pê de dibin dewşîrme. Xwe bona dijminên xwe diçirînin, ji wan pirtir nijadiya wan dikin, pêsnên wan didin. Xweyî ala wan, serkirdeyên wan, partîyên wan, polîtîka wan a qirêj derdikevin. Ji wan bêhtir nirxên dijminên xwe diparêzin. Bi ser de sixûriya dewletên pergala wan a serwer dikin. Kurdên welatparêz, kurdên kurdistanî aşkere dikin, zerarê didin wan. Lê çi bikin heta heta xwe bikûjin jî nikarin xwe ji trawmayan rizgar bikin. Bi tenê zerarê didin xwe didin eslê xwe, didin hebûna xwe. Dermanê pak kirina birînên wan ew nexêrî nîn e. Divê kurd nexweşên xwe jî xweyî derkeve, arîkariya wan bike. li nav xwe de bihewîne. Wan di nav lepên dijminên xwe de nehêle. Derman yekgirtiya kurdan e bi wî awayî azadbûna kurdan e, avakirina dewleta wan e. Wekî din kurd tu carî rizgar nabin. Tu carî dev ji vê doza pêwîstî bernede!

Bi hêviya serkeftina kurdan, bi hêviya avakirina dewleta Kurdistanê.

# Dagirkirina Ukraynayê û daxwaza dagîrkirin li Rojhilat



N. Vênûs Fayîq

W. Hesen Mukerem

Dema me dît ku Pûtîn di televîzyonê de ferman da hêzên xwe, ku êrîşê bikne ser Ukraynayê û wê dagir bikin, dîmenê artêşa Iraqê bi fermana Seddam ya êrîşa 2’ê Ab a sala 1990’an a dagirkirina welatê cîran Kuweytê anî bîra gelek kesan, bi taybetî Iraqiyan.

Ez bixwe di gelek waran de di navbera herdu dagîrkirinan de tu hevşibiyan nabînim. Di stratejî, hincet û mufredata dagirkeriya Seddam û Pûtîn de gelek cudahî hene, lê di dawiyê de êrîşên bi vî rengî, bi pênaseya xwe ya herî hêsan, welatek e ku xwe ji yê din bi hêztir dibîne û bi gelek hincetan mafê dagirkirinê dide xwe.

Çavdêrên siyasî sebeba vê pêngava Rûsyayê bi lawazbûna hikûmeta Zîlinskî ve girê didin, ku di sala 2019an de dema ku piraniya dengan bi dest xist, ku berê komedyen û nivîskarê sînemayê bûye, ji hunerê nêzîktir û ji siyasetê dûrtir, derbasiyeke siyasî tune bûye. Lê çend deqeyan berî destpêkirina êrîşê, Pûtîn tirsa xwe ji ezmûna nû ya Ukraynayê anî ziman û got, ew ê tu carî bi Ukrayna nû re xwe aram nabîne. Tirsa Pûtîn tirsa Tirkiyê ya ji ezmûna Kurdistana azad anî bîra min. Ew her wiha bi gotinek din hewl dide ku metirsiya qirkirinê û zîhniyeta Nazî ya li Ukraynayê bi dawî bike, di heman demê de Vîlademîr Zêlenskyê, Cihû, qet nebû xwediyê stratejiyek wisa. Lê ya cihê nîgeraniyê ev e ku ev cure dagirkerî di sedsala 21an de “helbet ger ji bo Pûtîn derbas bibe” dê xwesteka dagirkirina gelek deverên din ên cîhanê bi taybetî li Rojhilata Navîn û li derdora Kurdistanê çê bike.



Heger em helwesta Amerîkayê ya li hember Ukraynayê girîng bizanin, ku bi curek ji curan hevşêweya helwesta li hember kurdên Rojavayê Kurdistanê ku li hember DAIŞê bi tenê hêlan, Tirkiyeya ku xwe wek mezinhêzekî herêmî dihesibîne, û hertim neyarê ceribandina nîmçe serbixweyî ya Başûrê Kurdistan bûye û fikra wê hindê de ye ku bi çi avayekê li navxwe û derveyî Turkiyê de Kurdan ji nav bibe, çima divê em bi dûr bizanin sibehekê em ji xwew rabin û bibînin tankên tirkan li kolanên Hewlêrê de digerin?

Em ji bîr nekin ku çendîn caran Tirkiyê rasterast û nerasterast behsa Mûsil, Kerkûk û Tirkmenan kiriye ku divê vegerin ser Tirkiyê.

Gotinên rojnamevanê Amerîkî Charlie Dagata bi zelalî nerazîbûna civaka navneteweyî di helwêsta wî ya li hember Ukrayna Ewropî de “her çend ew ne endamek Yekîtiya Ewropî be jî” nîşan dide, ku bêtir medenî ye û hêjayî piştgirîyê ye.

Kurd bi helwêsta xwe ya li hember welatên Rojhilatê, tu carî nabin xwedî piştevaniya Ukraynayê, nemaze ku hemû cîhan dizane ku Kurdistan ne yekgirtî ye.

Axir, Tirkiye dijminê netewa Kurd e û îhtîmal heye ku Kurdistanê dagir bike û wêran bike.

Tişta ku tê dîtin ew e ku rêveberiya Kurd wê çawa pêşya vê îhtîmalê bigire û bi çi şiyaneke stratejiyan dê pêşî li vê bigire?.

# Di rêya bidest xistina mafê fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî de em dikarin dersa bijarte ya kurdî bikin pêlikekê






N. MISTEFA OZÇELÎKE

**MUSTAFA OZÇELÎK SEROKÊ GIŞTÎ YÊ PARTÎYA WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ (PWK):**

Di rêya bidest xistina mafê fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî de em dikarin dersa bijarte ya kurdî bikin pêlikekê

Di dibistanên li Tirkîyeyê û li Kurdistanê de, di polên 5,6,7 û 8an de mafê malbatan heye ku wek dersa bijarte, ji bo zarokên xwe dersa kurdî( Kurmancî, Kirdkî/Zazakî) hilbijêrin.Helbete ku mafê perwerdeya bi zimanê kurdî, fermîbûna zimanê kurdî mafekî rewa û bingehîn ê miletê Kurd e.

Lê belê, li gel parastina mafê fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî , divê em li mafê xwe yê dersa bijarte ya kurdî jî xwedî derkevin. Dewleta Tirkîyeye nuha di hilbijartina dersa kurdî de, di tayîn kirina mamosteyên dersa kurdî de gelek astengîyan derdixe; ev li ber çavan e.

Lê aşkereye ku, heger ji 2012ê heta îro, di navbeyan van 12 salan de, her sal 100 hezar, 200 hezar zarokên kurdan dersa bijarta ya kurdî hilbijartibûna, îro dê bi kêmnî mîlyonek zarokê kurdên kurd ên ku bi kurdî nizanîbûn, dê kurdî fêrbibûna.Herweha dê ew tirsa ji bo hilbijartina dersa kurdî jî derzeke mezin xwaribûya û Dewleta Tirkîyeyê jî dê nikarîbûya bi hêsanî, bi vî şiklê ku îro dike, astengî derxista.

Gava ku bi sedhezeran zarokên kurd dersa kurdî hilbijartibûna, dê pêwîstîya bi hezaran mamosteyên dersa kurdî jî derketa hole. Zêdebûna daxwaza li mamosteyên kurdî, di unîwersîteyan de, di beşên zimanê kurdî de, dê mamosteyên zimanê kurdî jî zêdetir bikira.Herweha zêdebûna daxwaza dersa bijarte ya kurdî, dê bazara pirtûkên kurdì, tîcareta bi zimanê kurdî, bazara telewîzyon û fîlm û xebatên cuda cuda yên bi kurdî jî firehtir bike.

Ev yeka jî dê bingehê fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî xurtir bike.Belê, bikaranîna mafê dersa bijarte ya kurdî jî, beşek e, îmkanek e, şansek e ji bo fêrbûn û lêxwedî derketina zimanê kurdî û dive em firsendê bikar bînin.

-Helwestên ku bi îhtîyad li dersa bijarte ya kurdî dinerin û piştgirîya wê nakin, zirarê digihînin fêrbûna zimanê kurdî -Her gaveke ku parastin û piştgirîya fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî (kurmancî, kurdkî/zazakî), axaftin, nivîsandin, fêrkirina zimanê kurdî dike, diparêze, teşwîq dike, pêşde dibe, pêk tîne, em girîng dibînin û em piştgirîya wan dikin.

Heger em bikaribin pêk bînin da ku bi sed hezaran zarokên kurdan dersa bijarte ya kurdî hilbijêrin, ev dê rêya fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî jî xweştir û xurtir bike. Ji ber wê jî em ji bo dersa bijarte ya kurdî dibêjin: ‘‘têrê nake, lê dîsa jî em dibêjin erê’’.

Ji ber vê yekê jî, em dibêjin, her gotin, helwest, boykot, biçûk dîtin, rêlibergirtin, sist kirin, teşwîq nekirin û li dij derketina ji bo dersa bijarte ya kurdî, dê gelek pirsan bîne hişê mirovî, dê zerarê bide fêrbûna zimanê kurdî, dê zerarê bide her çalakîyeke ji bo zimanê kurdî.-Em bangî rayedarên Dewleta Tirkîyeyê, miletê kurd û hemû alîyên peywendîdar dikin-Berîya her tiştî em bangî rayedarên Dewleta Tirkîyeyê dikin da ku van daxwazên me bînin cîh:

1-Ji bo ku dersa bijarte ya bi zimanê kurdî ji dibistana destpêkê ya zarokan û ji destpêka pola yekê heta dawîya pola 12yê be, divê gavên pêwîst bêne avêtin.Divê hemû astengîyên li ber dersa bijarte ya kurdî heyin ji hole bêne rakirin.

2- Ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û bibe zimanê perwerdeyê demildest divê gavên pêwîst bêne avêtin, di Qanûna Bingehîn û di hemû Qanûnên Dewleta Tirkîyeyê de guhertinên pêwîst bêne bicîh kirin.

Ji bo miletê kurd û hemû alîyên peywendîdar re jî ev banga me heye:

1-Zarokên xwe li dersa bijarte ya kurdî(kurmancî û kirdkî/zazakî) de qeyd bikin.

2-Kurdên ku bi kurdî nizanin hemû îmkanên xwe seferber bikin da ku hûn fêrî Kurdî bibin.

3-Hemû Kurdên ku bi kurdî dizanin, li nav malê, li kolanan , li sûkê, li dibistanan, di karên xwe de, di jîyana rojane, di tîcaretê de zimanê kurdî bikin zimanê xwe yê esas yê jîyanê.

Ajans, [2/17/2024 10:33 PM]

4-Hemû partîyên sîyasî, dezgehên sivîl , TV, radyo û rojnameyên kurdan; hemû sîyasetmedar, nivîskar rewşenbîr û hunermendên kurd, divê Kurdî bikin zimanê xwe yê esasî yê sîyasetê, nivîsandinê, çalakîyên dezgehên xwe û rewşenbîrî û hunerî.

5-Hemû partîyên sîyasî, dezgehên sivîl , TV, radyo û rojnameyên kurdan, karsazên kurdan, potansîyela Diasporayê ya kurdan, bi awayekî fiîlî û ji bo li ser Platformên Digital kurd bikaribin Kurdî fêr bibin divê hemû îmkanên xwe seferber bikin, projeyan çêbikin, dibistanan, kûrsan, dezgehan û amûran vekin, damezrînin.

6-Kurdên ku bi kurmancî dizanin divê hewl bidin Kirmanckî/Zazakî fêr bibin, fêhm bikin; Kurdên ku Kirmanckî/Zazakî dizanin jî divê hewl bidin ku bi kurmancî fêr bibin, fêhm bikin.

7-Ji kîjan partîyê dibe bila bibe, em bangî hemû parlamenterên kurd dikin da ku piştgrîya dersa bijarte ya bi zimanê kurdî bikin; ji bo dersa bijarte ya bi zimanê kurdî ji dibistana destpêkê ya zarokan û ji destpêka pola yekê heta dawîya pola 12yê be, d gavên pêwîst biavêjin û piştgirîya kampanyaya îmzeyê ya ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û bibe zimanê perwerdeyê bikin.

8-Di serî de em bangî hemû namzedên serokatîya beledîyeyan û namzedên endamtîya meclîsên beledîyeyan yên li Bakurê Kurdistan û namzedên serokatîya beledîyeyan û namzedên endamtîya meclîsên şaredarîya Stenbolê, Îzmirê, Mêrsînê, Edeneyê, Enqereyê, Antalyayê, Navçeyên Konyayê û bajarên din yên ku nifûseke zêde ya kurdan lê heye dikin da ku dibistan, kurs û dezgehên fiîlî û digital yên ku perwerdeya bi zimanê kurdî dikin û kurdî fêr dikin vekin.

17.02.2024

Mustafa Ozçelîk

Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK)

Kaynak: Di rêya bidest xistina mafê fermîbûn û perwerdeya bi zimanê kurdî de em dikarin dersa bijarte ya kurdî bikin pêlikekê (https://www.rupelanu.com/di-reya-bidest-xistina-mafe-fermibun-u-perwerdeya-bi-zimane-kurdi-de-em-dAjans, [2/17/2024 10:33 PM]

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Li ser sînorê Bane kolberek ji aliyê hêzên leşkerî yên dewletê ve hat kuştin

Êvariya roja Yekşemî 22'ê Rêbendanê, kolberekî ciwan yê bi navê "Şîvan Sehîhî" xelkê gundê "Bilke" ya ser bi bajarê Bane, li sînorê "Sardab"a vî bajarî, ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmetê ve hat kuştin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, hêzên leşkerî yên hikûmetê bêyî hişyariyek berê rasterast gule berdane vî kolberî.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Termê wî kolberî bo nexweşxaneya Selahedîn Eyûbî ya Bane hat veguhastin û piştre radestî malbata wî hat kirin.

Şîvan Sehîhî yê temen 20 salî û kurê Hîwa ye.



## 7 girtiyên li Seqizê bi cezayên hepsê, pere û cezayên temamker hatin mehkûmkirin

7 girtiyên li Seqizê bi cezayên hepsê, pere û cezayên temamker hatin mehkûmkirin
Ji wan girtiyan 7 kes, Hîwa Cehanî (40) kurê Mihemed, Şêrko (Xalid) Hîcazî (40) kurê Mihemed, Hîwa Tetayî (48) kurê Mihemed Salih û Safa Aelî (27) kurê Ebdulrehman, Mihemed Azad Emînî ne. 52 kurê Necmeddîn, Semîra Ehmedî (32) keça Mehmûd û Omîd Mûqedes (44) kurê Enwer ji aliyê şaxê yekem ê dadgeha şoreşa Seqizê ve hatin cezakirin u Di bin serokatiya dadwer Cewad Mistefayî de cezayê girtîgehê, pere û cezayên zêde li wan hat birîn.
Li gorî hukmê şaxê yekem ê Dadgeha Şoreşê ya Seqizê, Safa Aelî bi tohmeta "beşdarî civîna ji bo têkdana ewlehiya navxweyî" bi 3 sal û 6 meh û rojek zîndanê hatiye mehkûmkirin,Bi tohmeta "Propagandaya li dijî rejîma Komara Îslamî ya Îranê bi rêya weşandina gotar û wêneyan li ser torên civakî" 7 meh û 16 roj û bi tawana "bêhurmetî li rêberê Komara Îslamî ya Îranê" 15 meh û rojek zîndan hat mehkûmkirin û li gorî xala "th" a madeya 12 a yasaya kêmkirina cezayan ,Cezayê herî zêde li gorî dema girtina berê ye.



## Rêjîma Îranê cezayê bidarvekirinê bi ser mamostayekî Kurd de sepand

Mamosta "Mihemed Xizirnijad" ji aliyê dadgeha rêjîmê ve bi tohmeta "Mufsêd fîl erz" cezayê bidarvekirinê bi ser de hatiye sepandin.

Pêka rapora Ajansa Mafê Mirovî ya "Kurdpa"yê, mamosta "Mihemed Xizirnijad", mamostayê olî xelkê bajarê Bokanê ku li pêvajoya şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê de ji aliyê hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê ve hatibû binçavkirin, ji aliyê bêdadigehên rêjîmê ve hikmê êdamê biserde hatiye sepandin.

Mamosta "Mihemed Xizirnijad" li taya 3 a dadgeha şoreş a rêjîmê li bajarê Urmiyê, bi serokatiya binav dadwer "Riza Necefî" ve bi tohmetên wek "Mufsêd fîl erz", hewldan li dijî ewlehiya netewî bi rêya derbelêdan bi "Temamiyeta Erzî û serbixweyîya welat, propaganda li dijî nizam"ê, cezayê bidarvekirin û 16 sal girtîgeh bi ser de hate sepandin.

Pêka rapora "Kurdpa"yê, ew mamostayê Kurd ji aliyê hêzên ewlehî yên rêjîmê ve neçar bi îtirafkirin bi pêywendî digel girûpên tundajo yên olî, birêvebirina xwenîşandanên nerizayetî li Bokanê û xisarên pêketî bi cihên giştî hatiye kirin.

Navbirî li odeyên takekesî yên îtilaata rêjîmê li bajarê Urmiyê de bo heyamê 3 heyv û nîvan hatibû îşkencekirin û îtirafên bi zorê ji wî mamostayê Kurd standine.



Navbirî li heyama 20 salên derbasbûyê de çendîn caran rastî jêpirsînên dezgehên ewlehî yên rêjîmê hat û ji pêşnimêjiya mizgevtan li Sine û bokanê hate derxistin.

# Agirî


- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (464)